Piştgiriya Seroka EUTCC ê ji bo zarokên Kurda

Kampanya îmzeyan ya Kurdocide Watch-CHAK ê ji bo azadiya zarokên Kurda yê di zindanê bakurê Kurdistanê û Turkiyê piştgiryek mezin digire. Hefteyên derbasbûyî, taveyên dezgehên mafên mirovan yên girseyî, komele û niwênerên wan bi name û raporên taybetî hatin agehdarkirin. Her wisa, rêvebirên girştî yê komên hêzên siyasî di Parlementoya Ewropayê de hatin agehdarkirin û ji wan hate xwestin ku gavên pêwîst bavêjin. Yekîtiya Miletan û Rêvebiriya Yekîtiya ewropayê li ser pirsê hatine agehdarkirin û ji wan hate xwestin ku dest bavêjin pirsê. 11 komeleyên CHAK ê li Ewropa û Kurdistanê bi hevre piştgiriya kampanyayê didin. Her wisa, ji bo serkevtina kampanyayê, piştgiriya Enstîtuya Kurdî ya Brûkselê û Navenda PEN a Kurd û xebata wan, xebata heye piralî bihêz kir.

Di çarçoveya kampanya CHAK ê ya netewî û navnetewî de kampanya îmzeyan jî didome. Serokê Komîsyona Yekîtiya Ewropa-Turkiyê ji bo parastiona mafê bingehîn- EU Turkey Civic Commission (EUTCC) Prof Dr. Kariane Westrheim jî beşdarî kampanya îmzeyan ya CHAK ê bû. EUTCC ji bo raçavkirina bicîhanîna krîterên Kopenhagenê, pêşketina mafê mirovan li Turkiyê û pejirandina çanda kurdî ûhwd i dawiya sala 2004 an de ava bûbû. Bi konferans û çalakiyên xwe yên li ser pirsê li ewropayê tê nasîn.

Li ser kampanyayê dîtina Cîgirê Serokê Giştî yê CHAK ê wisa ye. Ji bo beşdarbûna şexis, dezgehên me yên netewî û piştgiriya wan gelek spas. Dostên Kurd yên mîna Kariane, Egon, û Ann jî beşdar bûne. Gelek spas. CHAK dê layiqî vê baweriyê xebata xwe bilind bike. Hêviya me ji dezgeh û gelê me ew e ku, bi rêya campaign@kurdocidewatch.net ê beşdarî kampanya me bibin û zarokên kurda bi tenê nehêlin. Çiyan anî zimên ku, ew ê pirsê bibin ber destê wezareta derve ya Emerîka.

Kurdocide Watch-CHAK
CHAK-Navenda Dokumentasyonê&EuroKurd News